

### Zeyneb Celaliyan û 15 siyasiyên Kurd di bin bivê de ne

Rijîma Îranê ya Îslamî, her demekê hin rikberên Îranî û bi taybetî yên Kurd, ( Şerş li dij Xweda) têne tewanbarkirin û bi dardevekirin.Lê, li vê dawiyê, 09-05-2010an, destlata devbixwîn ya Îranê, pênc ciwan ji wan çar Kurd bûn,- **Ferzad Kemangar, Elî Heyderiyan, Ferhad Wekîlî, Şêrîn Elam olî û Mehdî Îslamiyan**, di girtîgeha Evînê de bi dar ve kirin. Vêja dor hate çalakvana Kurd Zeyneb Celaliyan û 15 girtiyên siyasî û sîvîl ên Kurd: ( **Mistefa Selîmî, Hebîbula Letîfî, Zeyneb Celaliyan, Şêrko Marîfî, Reşîd Axkendî, Husên Xizrî, Enwer Rustemî, Rostem Erkiyan, Seyêd Cemal Mihemedî, Seyêd Samî Husênî, Ehmed Pûlaxanî, Hesên Taliû, Ezîz Mihemedzade, Hebîbula Gulperîpûr**).

Ku bi wê hicetê bi hukmê bidarvekirinê hatine tewanbarkirin. Guneh û sûcê wan ew e, Ku ew Kurd in û (Her kes dizane ku ew ji hemî maf û azadiyên xwe yên netewî û mirovane bêpar in, daxwaza aşî û wekheviyê û rûmeta xwe ya netewî dikin. Ma gelo ev, gunehkarî ye, û cezayê wê kuştin e?!



Hêjayî gotinê ye, ku temenê Zeynebê 28 salî ye, û di çend xulekan de hatin sezakirin . Derbarî vê bûyerê,, hevjinê Mîr Husên Mosewî, (**Zehra Rehneerd**), di daxuyaneke xwe de weha dibêje: "**Dibe van rojan, Zeyneb Celaliyan bê bidarvekirin, çima?. Gelo Xweda hezdikeyê ku jinek sembola nimûneyî û nermiyê were bidarvekirin?!". .. " Divê bo zeyneb û ew Zeynebên ku niha li ber mirinê ne, hizrek bê kirin, îro di 3/4 welatên cîhanê de, sezayê bidarvekirinê nemaye". Di dawiya daxuyana xwe de weha dibêje:**

**"Ez hêvî dikim ku Zeyneb neyê darvekirin, bila em hemî bi hev re li cihê şimşîkêşan bo xelkê, bi pêkenîn û hejêkirinê berê xwe bidin xelkê"**

\*\*\*\*\*

### Bajarokê Cindirêsê Bi Barkirina Heval Ehmed Hemo Re Reş Girêda

Piştî demekê ji nexwaşiyê, heval Ehmed di 24 î Hizêrana 2010 ne de, li dûriyê, -Almaniya-diçe ser dilovaniya Xweda.

Li 29î-06-2010 an termê wî dighê balefirgeha Şamê. Heval û merivên rehmetî pêşwaziya cendekê wî dikin. Roja din, berdestê sibê, hin hevalên wî yên



Heleb, telve karwanê wî dibin û berê xwe didine Bajaroka Cindirêsê. Li zaretê Henên jî, hin xwedî, dost û hevalan tevle karwanê bavê Ferîd dibin, di dû re, karwan di nav bajarê Efrînê re gerî. Piştî karwan digehê mala bavê wî- Cindirêsê cihê kar û xebata wî-, ji nû ve,berê wî dane gundê bav û kalan- **Çobana**-, û bi beşdariya xwedî, dost, hogir û hevalan, di goristana gund de tê veşartin. Pişt re, hevaleyê P.Y.D.K.S ( **YEKÎTÎ**) gotineke devikî pêşkêş dîke û li ser sincî, xeyset, kar û xebata haval Ehmed, di ber mafên gelê me yê rewê de disekine.

Em jî bi navê NEWROZÊ sersaxî ji meriv, heval û hogirên wî re dixwazin û lava ji Xweda dikin, ku giyanê wî di bin dilovaniya xwe ke.

Hêjayî gotinê ye, ku heval Ehmed di destpêka salên heştê de, derbasî nav refên partiya xwe bû, ta ku endamtiya herêmê werdigre. □ bi mîxwazî û bê dudilî kar û xebata xwe didomand.